Şopdara Rastiyê ye

# Ronahî

Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar :1307 14-Îlon-2025 www.ronahi.net/ku/

**Navnîşan**

www.ronahi.net/ku/ | rojnameyaronahi | @ronahikurdi55

nameronahi@gmail.com | Rojnameya Ronahî | +963 984 370 218

# 'Karê dirûtinê ji bo min pîroz e'

**Dîlan Mulhim\Qamişlo**

**Terziyê ji bajarê Amûdê Ebdulbaqî Mihmed zêdetirî 55 salan e karê dirûtina cil û bergan dike. Wî ji zaroktiya xwe ve ev pîşe hilbijart û heta niha jî wekî ku karekî pîroz e berdewam dike.**

Karê dirûtinê yek ji kevintirîn pêşeyên ku mirovan afirandiye û bi demê re pêş ketiye. Di demên berê de dirûtin bi bi derziya destan dihat kirin, lê her ku çû bi pêşketina teknîkê re dirûtin pêş ket. Di dema niha karê dirûtinê bi giştî bûye bi riya makîneyên dirûtinê yên nûjen. Yek ji terziyên bajarê Amûdê Edilbaqî Mihmed ku di sala 1954'an de ji bajarê Amûdê ji dayîk bû ye, zêdetirî 55 salan e karê terzîtiyê dike. Wî ji zaroktiya xwe ve ji vî karî heskiriye û 18 saliya xwe de dest bi kar kiriye. Di derbarê karê dirûtina çil û beragn de, terziyê ji bajarê Amûdê Ebdulbaqî Mihmed ji Rojnameya me re axivî.





**'Hezkirineke min a mezin ji karê dirûtinê re heye'**

Ebdilbaqî Mihmed anî ziman ku wî ji 18 salî ya xwe ve dest bi karê dirûtina cil û bergan kiriye û wiha got: "Dema ez biçûk bûm hezkirineke min a mezin ji karê dirûtina cil û bergan re hebû. Li ser vî bingehî min dest bi karê dirûtina cil û bergan kir, herwiha destpêkê ez li cem mamosteyekî Suryanî li bajarê Amûdê fêrî karê dirûtina cil û bergan bûm. Bi demê re ez hêdî hêdî fêrî karê dirûtinê bûm. Lewma di sala 1972'an de min dest bi karê dirûtina cil û bergan kir."

**'Karê dirûtinê ji bo min pîroz e'**

Mihmed axaftina xwe wiha berdewam kir: "Karê dirûtina cil û bergan ji bo min pîroz e, di heman demê de karê dirûtinê ji bo min kêfxweşiyeke mezin e. Ji ber ku hezkirineke min a mezin ji karê dirûtina cil û bergan re heye. Roja ku ez karê dirûtinê nekim, ez wê rojê pir xemgîn û nexweşim. Ev zêdeyî 55 salan e, ez li bajarê Amûdê karê dirûtina cil û bergan dikim, helbet êş û zehmetî hene, lê ez wan zehmetiyan di ber çavan re derbas dikin."

**'Ez tenê cil û bergên mêran didirûm'**

Ebdilbaqî Mihmed da zanîn ku ew tenê cil û bergên mêran didirû û wiha pê de çû: "Di destpêkê de, min kirasê mêran didirûtin, ji ber ku wê demê mêran kiras li xwe dikirin. Lê di dema me ya niha de jî kes kêm bû ye. Herwiha min sê zarokên xwe fêrî karê dirûtina cil û bergan kirin."

Terziyê ji bajarê Amûdê Ebdulbaqî Mihmed axaftina xwe wiha bi dawî kir: "Karê min niha di asteke pir baş de tê meşadin. Herwiha ez di karê xwe de pir rihetim. Nebûna eletirîkê dibe asteng li pêşiya karê min. Heta ku çavê min ronahiyê dibîne, ez karê dirûtina cil û bergan berdewam bikim."

## Gotina Dawî



### Pirsgirêka Sûriyê ya demokrasiyê heye!

Mihemed Seydi

Di çend hevpeyvînên bi fermandarê QSD'ê Mezlûm Ebdî re wî got ku ew bi qasî dikarin, dixwazin bi hêzên hikumeta veguhêz a Sûriyê re nekevin nava şer û hewl didin hemû nakokî û pirsgirêk bi diyalogê çareser bibin. Ev zêdetirî 9 heyvin rêjîma Baas hilweşiyaye û serokê wê Beşar El-Esed reviyaye, lê li Sûriyê tu tişt neguheriye.

Pirsgirêka gelê Sûriyê ya Demokrasiyê û ewlehiyê hebû, ev jî hîne heye û dewam dike. Bi hezaran mirov ji aliyê saziyên îstîxbaratê yên rêjîma berê ve dihatin revandin û kuştin, xizmên wan nikaribûn çarenûsa zarokên xwe nasbikirana û av û av diçûn. Niha jî roj derbas nabe ku nûçeyên mirov hatine girtin û paşê cenazeyên wan hatiye dîtin an jî li ser cenaze şopên êşkenceyê heye tên belav kirin. Her wiha di nava saziyên hikumeta demkî de gendelî hîn mezintir bûye û li hember parên pereyan, peymanên aborî yên bi guman tên îmzekirin û destûra derbaskirina madeyan ji bo hinek Bazirganên pereyên zêde bidin berpirsan tê dayîn. Bi rastî jî mirov dema hêviyekê ji vê desthilata nû bike, ew ê di bingeh de şaştî û xwe xapandin be. Ma kî ne yên niha li Koşka desthilatê li Şamê rûniştî ne? Yên zilamên desthilata berê bûn an jî çavtengî dikirin ka çima para wan a gendeliyê kêm e, rabûn ketin nava HTŞ'ê û grûpên dijber û wiha dest guherîn. Li aliyê din, HTŞ'ê Ku dîroka wê ya terorê eşkereye û xwe bi heft avan bişo jî ew ê ji vê zihniyeta xwe xilas nebe. Ji ber ji bilî tunderewî û kuştin û terorê tiştek di Tûrikê wê û endamên wê de tune. Lewma li Sûriyê bi çûyîna Rêjîmê tiştek neguheriye. Mirov hîne jî birçî ne û ewlehiya wan jî tune. Hemwextî vê tevliheviya li herêmên di bin desthilata veguhêz a Şamê de û bi taybet piştî komkujiyên li Hember Elewî û Durziyan, meha derbasbûyî hat ragihandin ku ew ê hilbijartinên Parlamantoyê werin li darxistin. Li gorî biryara serokê desthilatê Ehmed El-Şerei, wê ji sisiyan yek ji endamên vê parlementoyê ji aliyê wî bi xwe ve werin hilbijartin. Dîsa ew ê li Siwêdayê û bakur û rojhilatê Sûriyê jî hilbijartin nebin. Lê gelo ma pirsgirêk pirsgirêka hilbijartina ye?

Rêjîma Esed jî hilbijartin li dar dixistin û sanduq dadanîn û ji sedî 99,99 dengan digirt û meclisa gel jî ava dikir lê çima sûriyan serî hilda? Ji ber desthilat li peyî kursiya xwe ye û dest jê bernade, lê milet wekhevî, demokrasî û Edaletê dixwaze.

Dîsa bi lidarxistina van hilbijartinan di rojên pêş ên nêz de, HTŞ'ê dixwaze rewabûna xwe bide nîşandan û bibêje vaye me destûr çêkir, hikûmet ava kir û meclisa gel jî hildibjêrin. Lê tu alî wê baweriya xwe bi van çete û tunderewan neyîne. Pişta xwe bi dewleta Tirk xurt dikin, lê dewleta Tirk bi xwe şaş bûye ka ew ê çawa xwe li ser linga bigre. Dilê xwe bi peywendiyên bi Qeterê re xweş dike, lê me dît Îsraîl çawa ew bombebaran kir.

Ehmed El-Şeri bi hevdîtina bi Trump re dilê xwe xweş kir, lê Amerîka cezayên li ser Sûriyê ranekirin.

Di dawiyê de dixwazim bibêjim ku pirsgirêka xelkê Sûriyê ne li darxistina hilbijartina ye lê biryara Demokrasî, wekhevî û Edaletê ye. Ev jî hişmendiyeke sivîl û bîrbir dixwaze, ne selefîtî, îslamîstî û tunderewiyê. Lewma xelkê Sûriyê vê desthilata bi pêşengiya Ebû Mohamed El-Colanî qebûl nakin. Bakur û Rojhilatê Sûriyê, Siwêdaa û Berav nikarin vê zihniyetê qebûl bikin û ji bo wê nikarin bi Şamê re bighêjin encamekê.

### Sudoku:Pirs 57

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| | 9 | | | 3 | | 6 | | |
| 7 | | | | | | 4 | | |
| | 3 | | 1 | 4 | 8 | | | |
| | | 3 | | 7 | 4 | 8 | | |
| | 7 | | 5 | | 1 | | 3 | |
| | | 4 | 3 | 9 | | 1 | | |
| | | | 9 | 6 | 3 | | 1 | |
| | | 7 | | | | | | 9 |
| | | 8 | | 5 | | | 6 | |

### Sudoku: Bersiv 56

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 7 | 3 | 1 | 9 | 6 | 2 | 8 | 4 | 5 |
| 2 | 6 | 9 | 4 | 5 | 8 | 1 | 7 | 3 |
| 5 | 4 | 8 | 1 | 7 | 3 | 2 | 9 | 6 |
| 6 | 5 | 2 | 3 | 1 | 9 | 7 | 8 | 4 |
| 8 | 1 | 4 | 6 | 2 | 7 | 3 | 5 | 9 |
| 9 | 7 | 3 | 5 | 8 | 4 | 6 | 2 | 1 |
| 3 | 8 | 5 | 2 | 4 | 6 | 9 | 1 | 7 |
| 4 | 9 | 7 | 8 | 3 | 1 | 5 | 6 | 2 |
| 1 | 2 | 6 | 7 | 9 | 5 | 4 | 3 | 8 |

## FERHENGA BIWÊJAN

**LI SER KETINA JI QURETÎ, MEZINAYÎ Û HÊZÊ**

**Burxên wî sist bûne:**
- Ji quretiya xwe daketiye.

**Çeng û perên wî şkestin:**
- Hêviyên wî neman; ji hêzê ket.

**Darê xwe danî:**
- Ji xurtbûna xwe daket; hêza wî nemaye.

**Ew nema bi doxika gepcî digere:**
- Ew mir nema radibe.

**Min baskên wî birîn:**
- Êdî nikare zordestiyê bike.

**Per û baskên wî şkestin:**
- Hêviyên wî neman; ji hêzê ket.

**Roja wî ava bû:**
- Dema wî borî; **navûdengê** wî yê berê çû; bandora wî ya berê çû.

**Roja wî çû ava:**
- Bi heman wateyê.

**Şêr pîr dibe dibe qeşmerê rûviyan:**
- Dema yên xurt dikevin dibin pêkenok.

**Weke kerê guhsist lê hatiye:**
- Ji hêzê ketiye; êdî nikare xwe bilivîne.

**Zewrên wî sist bûne:**
- Ji quretiya xwe daketiye.

**LI SER TEVLÎNEBÛNA MIJARÊ**

**Bûk bi dilê zavê ye:**
- Em tevlî karê te nebin; tu dizanî; karê te ye.
(Dema yek dixwaze tiştekî ji xwe re bistîne jê re hingê dibêjin)

**Didanên min jê nasîqin:**
- Serê min bi vê mijarê naêşe; ev mijar ji min re ne xem e.


**Gur ku min nexwe bila gur be:**
- Kesê ziyana wî negihe min serê min pê naêşe.

**Kumê xwe kişand serê xwe:**
- Xwe bêdeng kir; tevlî nebû.

**Mûyek ji xwe nelivand:**
-Bandor lê nekir; ne li xema wî bû; pê eleqedar nebû; çawa ku nebihîstibe; çawa ku ne jê re hatibe gotin; li eynê xwe derneanî.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

---



## Mihemed Elî: Erdogan projeyeke hêzên sermayedar e

Nivîskar û lêkolînerê siyasî Mihemed Elî diyar kir ku niha li ser Sûriyê û giştî Rojhilata Navîn 3 proje hene, yek jê ya Îran e ku li ber têkçûnê ye, yên din jî projeya Îsraîl û ya Tirkiyê ku di nava pêşbaziyê de ne, li hemberî wan jî projeyeke civakî ya neteweya demokratîk a Rêber Apo heye.**R-3**

## Rewakirina zewaca zarokan bi qanûnê dibe?

Zewaca temenê biçûk sûc e di derheqê zaroketiyê de. Di cîhanê de zewaca temenê biçûk ne tenê li ser zarokên keç tê pêkanîn di heman demê de li ser zarokên xort jî. Ev diyarde di serdema 21'emîn de li Rojhilata Navîn hîn jî tê domandin, li gorî lêkolînan diyar dibe ku ji ber sedema pevçûn û qeyranan ev yek belav bûye. Lê ger mijar bibe rewakirina wê yekê bi zagonê; Weke Îran ev dibe mijara gumanan.**R-2**





## 'Navend ji bo bidawîkirina diyardeya derbiderbûna zarokan ava bûye'

Hevseroka Naveneda Helebça ya Zarokan Sureya Ebas anî ziman ku armanc ji avakirina Navenda Helebça bidawîkirina diyardeya derbiderbûn û parsektiya zarokan e û got, "Heya niha 2 hezar zarok derbasî navendê bûn û jê derçûne, li gorî şopandinê encamên baş ji bo zarokan pêk hat."**R-6**



## Cegerxwîn; Dengê civak û gelê xwe bû

Helbestvanê Kurd yê navdar Cegerxwîn kesayetek azad û welatperwer bû, ji bo doza gelê Kurd gelek kar û xebat da meşandin, li ser êş û doza gelê Kurd gelek helbest nivîsandin û helbestên wî heya îroj di nav civakê de zindî ne.**R-7**



**Çanda şûr û talanê**

Hafiz Ahmet Turhalli R-6

Şopdara Rastiyê ye

# Ronahî

Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar : 1307 14-Îlon-2025 www.ronahi.net/ku/ Nirx: 500 L.S

# LI HEMBERÎ GEF Û ÊRIŞAN ŞERÊ GELÊ ŞOREŞGERÎ

Îro li seranserî cîhanê û bi taybet li Rojhilata Navîn şerekî dijwar diqewime û guhertinên mezin pêk tên. Di nav herêma Rojhilata Navîn de herî zêde Sûriyê bûye qada pêkanîna planên hêzên hegemon. Di rewşa heyî de ku Sûriyê û bi taybet Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê tê re derbas dibe, pêkanîna Şerê Gelê Şoreşgerî û xweparastinê ferz dike.**R-5**






## Siyaseta hikumeta veguhêz siyaseta parçebûnê ye

Endamê Meclisa Giştî ya PYD'ê Welîd Dingilî diyar kir ku siyaseta hikumeta veguhêz li Sûriyê dimeşîne wê Sûriyê parçe bike. **R-4**

# Rewakirina zewaca zarokan bi qanûnê dibe?

Zewaca temenê biçûk sûce di derheqê zaroketiyê de. Di cîhanê de zewaca temenê biçûk ne tenê li ser zarokên keç tê pêkanîn di heman demê de li ser zarokên xort jî. Ev diyarde di serdema 21'emîn de li Rojhilata Navîn hê jî tê domandin, li gorî lêkolînan diyar dibe ku ji ber sedema pevçûn û qeyranan ev yek belav bûye. Lê ger mijar bibe rewakirina vê yekê bi zagonê; Weke Îran ev dibe mijara gumana

**Esma Mistefa/Qamişlo**

Zewaca zarokan
Berî dîroka nûjen, zewaca zarokan pratîkek hevpar bû ku li her derê cîhanê dihat dîtin. Bi hatina sedsala 20'an re, pirs li ser vê pratîkê derketin holê. Piraniya hikûmetan, lê ne hemî, êdî piştgirî nedanê û seranserî cîhanê ev diyarde kêm bû.

Zewaca zarokan an jî zewaca di temenê biçûk de zewacek fermî an nefermî ya zarokên di bin temenê 18 salî de ye. Hat destnîşankirin ku piraniya kesên ku ji van kiryaran bandor dibin keç in ku piraniya wan ji statuya civakî-aborî ya nizm in. Di gelek rewşan de yek ji hevjînan zarok e û ew zarok bi gelemperî û herî zîde zaroka keçe. Ev ji ber girîngiya keçiktiyê ye ku li ser jinan hatiye ferzkirin. Sedemên sereke yên zewaca di temenê biçûk de xizanî, buhayê bûkê, qelen, kevneşopî û qanûnên çandî yên ku destûrê didin zewaca di temenê biçûk de, zextên olî û civakî, tirsa ji bêzarbûnê, nexwendin û nepejirandina karkirina jinan ji bo pereyan e.

### Her sal 12 mîlyon keçên biçûk têne zewicandin

Zêdetirî 650 milyon jinên ku îro li seranserê cîhanê dijîn, di zarokatiya xwe de zewicîne. Her sal herî kêm 12 milyon keç berî ku bigihîjin 18 saliya xwe tên zewicandin. Bi vê yekê her deqeyekê 28 keç dizewicin. Ji her pênc keçan yek berî 18 saliya xwe dizewice an jî tê destgirtin. Bi taybet di welatên nepêşketî de ev hejmar ji du qatan jî zêdetir e: % 40 keçan berî 18 saliya xwe dizewicin, û %12 keçan jî berî 15 saliya xwe dizewicin.

### Sedemên Zewaca Zarokan

Li gorî Fona Nifûsê ya Neteweyên Yekbûyî, faktorên ku zewaca zarokan teşwîq dikin ev in: xizanî, newekheviya zayendî, danûstandinên erd an milkê, û çareserkirina nakokiyan. Kontrolkirina cinsîyeta keçan, parastina rûmeta malbatê, adet û kevneşopiyan, û bêewlehiyê, nemaze di dema şer, birçîbûn û nexweşiyan de. Faktorên din jî hene wekî girêdanên malbatî ku tê de zewac rêyek e ji bo xurtkirina têkiliyên di navbera malbatan de.

### Di raporeke YN de ku derbarê zewaca zarokan de di sala 2019'an de derxistibû wiha dibêje:

Lêkolînê eşkere kir ku zewaca zarokan di nav mêran de li Efrîqeya başûrê Sahrayê, Amerîkaya Latîn û herêma deryaya Karayîban, Başûr û Rojhilatê Asyayê û Okyanûsa Pasîfîk pirtir e. Li gorî daneyan, ji sedî 28'ê mêran li Komara Afrîkaya Navîn di temenê zarokatiyê de zewicîne, ku di zewaca zarokên kur de di rêza yekem de ye.

### Li îranê bi taybet Li gorî madeya 1041 a Qanûna Sivîl Ji bo keçan temenê zewacê yê herî kêm 13 salî hatiye destnîşankirin.

Di cîhanekê de ku têkoşîna li dijî zewaca zarokan wekî prensîbeke bingehîn a mafên mirovan tê hesibandin, gelek welat hewl didin ku bi reformkirina qanûnên xwe temenê zewacê bigihînin 18 salî. Rejîma melayan li Îranê ber bi aliyekî berevajî ve diçe. Li Îranê, zewaca keçên temenbiçûk ne tenê destûr e, lê di qanûna sivîl de bi awayekî eşkere hatiye bicîhkirin, ku rewatiya wê ya yasayî dide wê. Li gorî madeya 1041 a Qanûna Sivîl a rejîma melayan, temenê zewacê yê herî kêm ji bo keçan 13 sal û ji bo kuran jî 15 salî, hatiye nivîsandin. Lê xala sereke ew e ku qanûn bi xwe deriyê zewacê di temenên ciwan de vedike. Li gorî di madeyê de hatiye nivîsandin wiha dibêje:
"Peymana zewaca keçekê berî ku ew bigihîje temenê sêzdeh salî tê girêdan, û peymana zewaca kuran berî ku ew bigihîje temenê panzdeh salî tê girêdan. Bi destûra xwediyê wê (Malbat), bi şertê ku bi biryareke dadgeha rayedar were hesibandin".
Bi gotineke din, eger bav û dadger guncaw bibînin, zewaca keçek di bin temenê 13 salî de dibe qanûnî. Ev destûr, ku qanûnî xuya dike, zewaca zarokan rewa dike. Ew hikûmetê ji çavdêrekî bêalî vediguherîne saziyeke zagonsaz ku piştgiriyê dide vê diyardeya xeternak.





### Rejîma melayan Peymana Mafên Zarokan binpê dike.

Ev qanûn bi awayekî eşkere li dijî Peymana Mafên Zarokan e, ku Îran di sala 1993an de tevlî wê bûye. Di vê Peymanê de, zarok bi awayekî eşkere wekî her kesê di bin temenê 18 salî de tê pênasekirin, û dewlet mecbûr in ku wî ji her cûre îstîsmarê, tevî zewaca zarokan, biparêzin. Lê belê, rejîma melayî a ku dijminê jin e, bi şîroveyên xwe yên îdeolojîk û hiqûqî, tevlî şertên vê peymanê nebûye. Hê zêdetir rê li ber binpêkirina wê bi rêbazên yasayî vekiriye.
Tenê li çend welatan, wek Yemen û Nîjer, temenê zewaca keçan ji Îranê kêmtir e, ji ber ku qanûn temenekî diyarkirî destnîşan nake. Bi vî yekê Îran, bi derxistina temenê zewaca yasayî ya 13 salî ji bo keçan, di cîhanê de sêyemîn welatê ku temenê zewaca yasayî ya herî nizm lê heye ye.
Qanûna zewaca zarokan a Îranê sembola avahiyeke ku di bin maskeya Şerîet û qanûnê de serdestî, cudakarî û tundûtûjiyê ava dike. Heta ku qanûnên weha di sîstema yasayî ya Îranê de bimînin, her axaftina li ser edalet, parastina zarokan, an rûmeta mirovan dê vala û sloganî bimînin.
Me Îran weke mînak anî, ji ber Îran vê yekê bi rêya zagonî pêk tîne. Lê belê di Rojhilata Navîn de ev diyarde bi awayekî pir bi kok tê meşandin.

### Jin û keç bi taybetî li welatên ku di şer û pevçûnan de ne, Sûriya

Li gorî lêkolînek li ser zewaca zarokan li Sûriyê ku di sala 2018'an de hatiye weşandin "Girls Not Brides/ Keçikin ne bûkin" dît ku zewaca zarokan ji bo keçên Sûrî yên ku penaberî Urdun, Lubnan, Îraq û Tirkiyeyê bûne, pirsgirêkek mezin dibe. Rûxmî ku rêjeya jinên Sûrîyeyî yên di navbera 20 û 25 salî de ku berî gihîştina temenê hejdeh salî zewicîne, berî destpêkirina şer ji %13 derbas nebûye.
Bo nimûne, hejmarên li Urdunê hatine tomarkirin nîşan didin ku zewacên zarokan bi demê re zêde dibin, rêjeya zewacên qeydkirî yên keçên di bin temenê 18 salî de ji %32 di destpêka 2014'an de derbas kiriye. Li Lubnanê, %41ê jinên Sûrî yên koçber berî 18 saliya xwe zewicîne. Ji ber ku gelek zewac nayên qeydkirin, dibe ku ev hejmar di rastiyê de hîn zêdetir bin.

### Divê em ji bîr nekin

Tundûtûjiya zêde û koletiya cinsî ya ku di salên 2014 û 2015'an de bi bilindbûna cîhadîzmê re hat, jinan xiste xetereyek mezintir. Keçên ciwan mîna pez li sûkê hatin firotin. Ev yek her hêviya bidestxistina mafên qanûnî yên jinan, wek mînak diyarkirina temenê zewacê yê herî kêm 18 salî, tehdît kir. Gelek malabat jî ji bo ku keçên xwe ji destê wan cîhadiyan xilas bikin, mecbûr diman ku zarokên xwe yên keç bizewicînin. Gelek sedemên ku hêştin ev diyarde derkeve hene, bi taybet di Rojhilata Navîn de. Lê di sedsala 21'emîn de berdewamiya van sûcan, cûceke ku nayê efukirin.

### Di Rojhilata Navîn de rêjeyên texmînî ji bo her welatekî (zewaca berî 18 saliyê):

Yemen 50–52%
Sûdan 34–38%
Tirkiye 28%
Îraq 28%
Misir 17%
Mexrêb 16%
Filistîn 15%
Sûriya (berî şer) 13%
Îran 17%
Urdun 36%
Lubnan 39%

### Dawî

Berhevkirina daneyên rast li ser zewaca zarokan pir caran dijwar e, hetta di demên aştiyê de jî. Ev ji ber kêmasiyên daneyan an veşartina zewacên zarokan ji ber neqanûnîbûna wan e. li hember van cûcan hemû rêxistin û tevgerên ku xwe weke parêzvanên mafê zarokan dibênin berpirsyarin. Ger îro ev yek di encama pevçûn, pirsgirêk û hiîmendiya civak û malbatê, rewşa jiyanî û derxistina zagonan re tê kirin. Divê li hember wê bêdengî nebe û nebe hinceta berdewamiya van kiryaran. Ger îro li cîhanê şoreşên jin tên lidarxistin li kuderê cîhanê dibe bila bibe rûdanan van kiryaran di derheqê zaroketiyê de, sûc û şerm e.



# Cegerxwîn; Dengê civak û gelê xwe bû

Helbestvanê Kurd yê navdar Cegerxwîn kesayetek azad û welatperwer bû, ji bo doza gelê Kurd gelek kar û xebat da meşandin. Li ser êş û doza gelê Kurd gelek helbest nivîsandin û helbesrtên wî heya îroj di nav civakê de zindî ne.

**Navenda Nûçeyan**

Helbestvanê Kurd yê navndar Cegerxwîn yek ji girîngtirîn helbestvanê Kurd e. Cegerxwîn li gelek herêman digeriya û hin caran direviya ji ber desthilatdaran, dema ew li herêman digeriya wî êş û azara gelê Kurd didît, ji ber êşa Kurdan wî gelek helbest çêkirin. Ew kesayetek hêja û welatparêz bû, ji bo azadiya gelê Kurdan wî kar û xebat kiriye. Bi helbest û berhêmên xwe yên bi nav û deng bû, herwiha heya roja îro berhemên wî xwedî cihek taybet û girîng in.

### Jidayikbûn û Zaroktî

Cegerxwîn, navî wî yê ras Şêxmûs e, di sala 1903'an de li gundê Hesarê hatiye dinê, 11 xuşik û birayê wî hebûn hemû wefat bûn, tenê 3'ê ji wan man; Sêxmûs, Xelîl, Asya. Di sala 1918'an de bavê wî Hesen li bajarê Amûdê serê xwe danî û çûye ser dilovaniya xwe. Di sala 1919'an de li gundê Bêdir-Memo dayika wî Eyşan ya heftê salî jî wefat kir. Cegerxwîn demekê li cem xuşk û birayê xwe mabû.
Cegerxwîn, dengê êş û azara gelê Kurd di têkoşîna azadiyê de, di sala 2003'an de kete sedsaliya xwe de. Dema ku ew yanzdeh salî bû, di destpêka şerê yekemîn yê cîhanê de, tevlî malbata xwîşka xwe binxet bû penaber li welatê xwe. Ew li gundê Amîd girêdayî Qamişloyê bi cih bû. Cigerxwîn di sala 1921'an de xwendina xweyî medresê bi dawî kir û bawernameya melatiyê wergirt. Piştî vê yekê Cegerxwîn dest bi melatiya gundê Tell Şair kir û ji ber vê yekê jî navê Mele Sêxmûs lê hate kirin.

### Kar û xebatên wî li Sûriyê [Kurdistanê]

Di sala 1920'an de çûye xwendegeha olî û çend salan li ser hev li Rojava, Başûr û Rojhilatê Kurdistanê geriyaye û rewşa gelê Kurdistanê baş nas kiriye.
Di sala 1927'an de bi keça xalê xwe re dizewice û li Amûdê bicih dibin. Di sala 1928'an de xwendina xwe qedand û bawernameya xwe wergirt û bû melayê gundê Hazda jorî û di wê salê de dîwana xwe ya yekemîn nivîsiye, ev dîwan winda bibû û piştî windabûnê bi çend salan hat dîtin lê nehat çapkirin.
Di sala 1937-1938'an de, Cegerxwîn û hevalên xwe Komelak li bajarê Amûdê ji xortên Kurd re vekirin û komela wan gelek berepêşçû, lê bi navtêdana hin mirovên nezan û dijminê gelê Kurd Fernsiyan ew komele girtin.
Di sala 1946'an de Cegerxwîn mala xwe ji gund anî bajarê Qamişlo û kete nav pêlên rêzanî, siyasetê û di wê salê de Civata Azadî û Yekîtiya Kurd hate çêkirin: Dr. Ehmed Nafiz serok û Cegerxwîn sekretêr bû.
Di sala 1948'an de Cegerxwîn bûye hevalê Partiya Komunîst a Sûrya yê. Di sala 1949'an de cara yekemîn bû ku Cegerxwîn hatiye girtin. Di sala 1950'an de Cegerxwîn dikeve Civata Aştîxwazên Sûrya yê û di hundirê wê de kar dike. Di sala 1954'an de Cegerxwîn ji hêla komonîstan ve bû namzadê perlemana Sûriya yê. Di sala 1957'an de Cegerxwîn ji komonîstan dûr dikeve û di wê salê de Cegerxwîn û hevalên xwe rêxistina AZADÎ saz dikin, lê piştî demekê Cegerxwîn û hevalên xwe rêxistina xwe fesix dikin û bi Partiya Dîmoqratî Kurdî re dibin yek. Di sala 1959'an de Cegerxwîn direve Îraqê û sê salan li wir dibe mamosteyê zimanê kurmancî li Zanîngeha Bexdayê beşê kurdî. Di sala 1962'an de hukûmeta Îraqê bera Cegerxwîn dide û ew û zarokên xwe vedigerin Sûriya yê, Cegerxwîn tê girtin û piştî demekê tê berdan. Di sala 1963'an de dîsa Cegerxwîn tê girtin û dikeve Zindana Mezê li bajarê Samê, lê piştî demekê tê berdan lê wî nefî (Surgun) dikin û dişînin bajarê Siweyda nav Durziyan, lê piştî demek ne dirêj tê berdan û vedigere bajarê Qamislo yê. Di sala 1969'an de Cegerxwîn diçe Kurdistana Îraqê nav şoreşa kurdî û nêzîkî salekê li wir dimîne. Di sala 1970'î de Cegerxwîn ji Kurdistana Îraqê vedigere Sûriya yê. Di sala 1973'an de Cegerxwîn direve Libnanê û dîwana xwe ya sisyan KÎME EZ? û çîroka Salar û Mîdya li wir çap dike. Di sala 1976'an de Cegerxwîn vedigere Sûriya yê û heta sala 1979'an li wir dimîne.



### li Siwêdê jiyana xwe ji dest da

Di sala 1979'an de Cegerxwîn ji Sûrya yê direve û diçe Siwêdê û pênc salên xwe yên dawî ji jiyana xwe li Siwêdê derbas dike. Di 22 Cotmeha 1984'an de li bajarê Stockholmê Cegerxwîn koça xwe ya dawî kir. Cegerxwîn di hewşa xaniyê xwe de li bajarê Qamişlo yê hatiye veşartin. Zarokên wî yên ku li dû xwe hiştine du kur û çar keç in: Keyo, Azad, Gulperî, Rojîn, Beniye, Selam.
Hin berhemên Çegerxwîn:
Hawar dikim
Ranabî kes
Sêx û mela
Û pîr û qes
Bi xaç û xist
Û mizgevt û dêrEm xistine
Tora neyêr.
Hawar, hewar
Hawar, hewar !
Van çûçikan
Dexlê me xwar.
Sed camî
Dêr û kenişt
Naqos û bang
Tîr û xişt
Sed lek ji
Tîpên Lemterew
Bi kêr me nayên
Tev derew.
Cegerxwîn bi dil û can hewl dida piştgiriya têkoşîna azadiya gelê Kurd bike. Wek mînak di dema muxtariya sala 1961'an li başûrê Kurdistanê wî li zanîngeha Bexdayê beşa Kudiya Jorîn saz kir û ji bilî vê wî bernameya çanda Kurd di radyoya Bexdayê de amade dikir. Ji sala 1959 heta sala 1963-an Cegerxwîn li Bexdayê dima. Ji bilî helbestên siyasî (neteweyî û sosyalîst) wî helbestên li ser evînê jî dinivîsîn, ku pirê caran êş û jana evînê dinanîn ziman, herwiha carcaran behsa xweşî û şahiya evînê jî dikirin. Gelek stranbêjên Kurd Helbestên wî ji bo stranên xwe bi kar anîn. Heşt dîwanên Cegerxwîn yên helbestan hatine weşandin, herwiha wî pirtûka bi navê "Tarîxa Kurdistanê", ferhengeke zimanê Kurdî û pirtûkên li ser folklora Kurdî. Bi kar û barê xwe, bi berhemên xwe Cegerxwîn di ronakkirina girseyên li Kurdistanê de rolêkî gelekî mezindilîst, mirov dikare wî mîna nîşaneke neteweyî bibîne. Cegerxwîn parabêtir jiyana xwe li Qamişlo borand, lê paşê mecbûr ma ku dev ji welatê xwe berde û here Stockholmê. 22 êlûna sala 1984-an Seydayê Cegerxwîn çû ser dilovaniya xwe. Cegerxwîn li hewşa mala xwe ya li Qamişloyê bi tevlîbûna dehhezaran Kurdên heskiriyê helbestên wî hate bi cih kirin. Ev kesayetiya mezin ya wêjaya Kurd, mamosteyê Qedrican, dikeve sedsaliya xwe. Divê ku ew newe ji bîr kirin.

# GULAVA EŞQÊ

**Cîger Efrîn**

Ji dil bipirse çîroka evînê
Barê herî girane li vê dinê
Çend lalezar hişkbûn j' êşa derdfiroşan
Çend dil çilmisîn j' payîna bêdînê

Çav d' min de şikandin laleyeke zer
Li paş wê nema laleya zor ben zer
Çavşikandinên wan xencera ser dil
Bê eşqa lalê najîm wek beşer

Gotin evîn nabe bêyî azadî
Min got, zaroka eşqê ye azadî
Li min kombûn dilhişk, gêj û korewar
J' hawara wan dîn û har bûm ew çendî

Bi zaroka evînê bûme xweda
Di mezikirina wê de biryar da
D' rê de rastî Nuredîn SOFÎ hatim
Rûkenî got;"bi eşqa ROJ min nûr da"

B' ser lalezar de nûr da Nurîyê min
Ew e vebêjê çêroka te û min
B' ser dilan de reşand gulava eşqê
Pir bûn Nurî, Koçer û delalên min

L' pêşberî vînê (eşqê) zorî mabû bê por
Bi kenê wan pijkivîn laleyên sor
Êş şermok bû bi jîna xwe di wan de
Çiqas geş bûn bax û bostan li hawîrdor…

# ‘Navend ji bo bidawîkirina diyardeya derbiderbûna zarokan ava bûye’

Hevseroka Naveneda Helebça ya Zarokan Sureya Ebas anî ziman ku armanc ji avakirina Navenda Helebça bidawîkirina diyardeya derbiderbûn û parsektiya zarokan e û got, “Heya niha 2 hezar zarok derbasî navendê bûn û jê derçûne, li gorî şopandinê encamên baş ji bo zarokan pêk hat.”

**Hemza Sêvo/ Qamişlo**

Navenda Helebça ya Zarokan, navendeke bi armanca perwerdekirin, guhpêdan û geşepêdana zarokan di 1’ê Îlûna 2022’yan de ava bûye. Ev navend ji hêla Şaredariya Gel a Bajarê Qamişlo ve li gundê Xizna yê ku bi 19 kîlo metreyan dikeve rojhilatî başûrî Qamişlo hat damezrandin. Niha li vê navendê 20 zarokên bêkes, ên derbiderbûyî û zarokên ku parsektî dikirin, hene. Derbarê kar û xebata Navenda Helebça ya Zarokan, hevseroka wê Sureya Ebas ji rojnameya me re axivî.

**‘Navend ji bo bidawîkirina diyardeya derbiderbûna zarokan ava bûye’**

Sureya Ebas da zanîn ku armanc ji avakirina Navenda Helebça bidawîkirina diyardeya derbiderbûn û parsektiya zarokan e û wiha got: “Navenda Helebça ya Zarokan ji hêla Ofîsa Zarokan a Şaredariya Gel a Bajarê Qamişlo ve hatiye vekirin. Ji ber ku rêjeya parsebûn û derbiderbûna zarokan li herêmê zêdebibû, ev navend hat avakirin da ku ev herdû diyarde bi dawî bibin. Herwiha armanc ji avakirina Navenda Helebça, parastina zarokan ji tundiya ku li kolanan li ser wan tê kirin e. Di heman demê de ji bo jîngeheke guncav ji bo zarokan were avakirin, hewldaneke bi vî rengî çêbû û pêk hat.”

**‘Heya niha 2 hezar zarok derbasî navendê bûne û derçûne’**

Sureya eşkere kir ku ji avabûna navendê heya roja îro nêzî 2 hezar zarok derbasî navendê bûne û jê derçûne û weha domand: “Navenda Helebça hat amadekirin ji bo guhpêdana bi zarokan, da ku zarok di jîngeheke guncav de bijîn. Li aliyekî din ji bo zarok pêdiviyên jiyanê yên pêwîst bi dest bixin, guhpêdana perwerdeyî, tenduristî û lidarxistina çalakiyên girêdayî jêhatiyên wan, tên pêkanîn. Zarokên ku derbasî navendê dibin, temenê wan ji zarokên 5 salî heya 18 salî ye. Di destpêkê de dema ku zarok derbasî vir dibin, em gelek astengiyan dibînin, ji ber ew di jîngeheke neguncav rabûne, hem jî temenê hin zarokan di sînorê sîpetiyê de ye. Lewma her zarokeke ku tê navendê, guhdana tekane ji hêla perwerdekaran çêdibe. Di heman demê de kesên perwerdekar danûstandinê bi wan re dikin û hewl didin ku nas bikin, çima zarok neçar bûne derbider bibin û parsektiyê bikin. Ev yek jî heya ku zarok derbasî atmosfera navendê dibin û danûstandina wan bi derdorê re pêk tê. Hêjayî bibîrxistinê ye ku xebata me berdewam dike û heya niha derdora 2 hezar zarok derbasî Navenda Helebça bûne û jê derçûne.”



**‘Zarok tên perwerdekirin û çalakiyên guncav ji bo wan tên lidarxisitn’**

Sureya Ebas diyar kir ku ew perewerdeyên guncav didin zarokan û wiha axivî: “Li navendê perewerdekarên bispor ji bo zarokan tên amadekirin. Di heman demê de hemû cûreyên perwerdeyan ji bo zarokan tên dayîn, ew bi awayekî sîstematîk dixwînin, xwendina taybet ji bo wan tê dayîn. Ji bo ku zarok bikevin Gelek ji wan hene ji xwedinê bêpar mane, armanca me jî ew e ku em zarokên zane biafrînin. Li aliyekî din em li gorî jêhatiyên zarokan perwerdeyên pîşeyî weke dirûtina çekan, pîşeya berberiyê û hwd tên dayîn. Perwerde tên dayîn heya ku perwerdekar tekez dibin ku bandora derbderbûn û parsektiyê li ser zarokan bi dawî bûye.”

**‘Xebatên navenda Helebça encamên baş bi xwe re anîn’**

Hevseroka Naveneda Helebça ya Zarokan Sureya Ebas anî ziman ku navendê encamên baş ji bo zarokan bi xwe re anîn û wiha bi lêv kir: “Navenda Helebça bandoreke erênî li zarokan kir, ji ber ku em bi hemû derfetên xwe û ji hemû aliyan ve guh didin zarokan. Em dibînin ku bi riya avabûna vê navendê encamên baş pêk hatin. Her zarokeke ku derbasî navendê dibe û jê derdikeve, sûdê werdigire, zarok fêrî sincên pak, xwendin, nivîsandin û nirxê zarokatiyê bibe. Wekî tê zanîn gelek zarok ji navendê derçûne, piştî ku ew derketin, dîsa serdana me kirin û spasdariya me kirin, hem jî guhertina ku bi saya Navenda Helebça bi wan re çêbû, bi erênî nirxandin.”



## Çanda şûr û talanê

Hafiz Ahmet Turhalli

Di 27’ê Sibatê de, Rêber Abdullah Ocalan ji bo aşitiyeke mayinde di nav Kurd û Tirkan de pêk were, pêvajoyeke çareseriyê da destpêkirin.
Gavên ku ji hêla bizava Kurd ve hatin avêtin, gavên gellekî wêrek û dîrokî bûn. Bi avêtina van gavên wêrek û dîrokî, hemû aliyên têkildar û dijber jî matmayî man.
Ev gavên wêrek û bi cesaret, nîşana feraseteke pêşketî û bixwe bawerbunê jî da nîşandan. Dema bizava netewiya Kurd ev gavên wêrek pêk anîn, hemû cîhanê, ji Çînê heta dewletên yekbuyî yên Emerikayê piştgirtiya xwe nîşan dan. Pirs ev e: Gelo birêz Ocalan bi çi bawer bû û çawa kare di bin tecrîdeke giran de van gavên girîng bê pirsgirêk bavêje? Diyare; Neyarên milletê me ne serokatiya vê bizavê û ne jî vê bizavê baş nas nakin! Ger rastiya vê rêxistinê were naskirin, dê bibînin vê rêxistinê çend sed caran, xwe ji tunnebunê afirandiye, çend caran ji xweliya xwe xwe nû kiriye. Neyarên vê milletê hê jî vê rêxistinê û serokataiya wê baş naşopînin.
Di destpêka damezrandina vê rêxistinê de, serkirdeyên vê rêxistinê hatine desteserkirin û zêdetirî wan di tekoşînê de bûne cangorî.
Serokê vê rêxistinê ev 26 sal in di bin tecrîdêke giran de dijî.
Tevî hemû êrîş û daxwazên tunnekirinê jî, ev rêxistin her diçe mezintir dibe.
Ev bizav îro li çar hêlên Kurdistanê û hemû cîhanê weke rêxistinekî şoreşger tê qebûlkirin.
Lê diyare neyarên me yên ku ev sed sal zêdetire bi me re di nava şer û pevçûnan de ne, hê jî ji ya xwe danakevin. Ew hê jî me biçûk û bêhêz dibînin. Li gor wan Kurd, Kurdên sed sal berê ne, ji wan ditirsin û em çawa bixwazin dê Kurd serî bitewînin.
Ji ber wê serokkomar Erdogan, Bexçelî û hawîrdorê wan gefan li bizava Kurd û milletê Kurd dixwin.
Erdogan dibêje; ger em Şûr ji şûna wê derxînin, gotin û pênûs wê bê wate bimînin.
Gelo ev pêncî sale we bi Kurdan re kengê pênûs û gotin bikar aniye?
Berovajî wê, we tenê şûr, top, tanq û firok bikar anîne.
Di vî şerê de, bi sed hezaran mirovan jiyana xwe ji dest dan, bi deh hezaran birîndar çêbûn, bi deh hezaran di girtîgehên de ne, bi hezaran gund, bi dehan bajar û bi mîlyonan Kurd bi darê zorê hatine penaberkirin.
Dema Kurd bi hijmarên hindik bûn ji we neditirsiyan. Neha bi milyonan Kurdên şiyarbûyî hene! Ger hûn dixwazin biratî, aşitî û wekhevî cîbicîh bikin, divê hûn zimanê xwe biguherînin.
Divê hûn weke mirovên têgihaştî, daxuyaniyên kêrhatî bidin.
Hûn bi nêzikbûnên berê nikarin vê pirsê çareser bikin. Divê axeftinên we bi hurmet bin. Nirxandinên we ji dil bin û biratiya we ne biratiya mar û rovîyan be.
Hûn carekê din şûr bikar bînin, ew ê Kurd jî berxwe bidin.
Berxwedana Kurdan li dinyayê deng vedaye û yên herî zêde vê berxwedanê dinasin hûn bi xwe ne.
Îro milletê Kurd li cîhanê hatiye naskirin û hezkirinekî Kurdan di nava gelê cîhanê de çêbûye.
Dibe ku hê jî têkiliyên we bi henek desthelatên cîhanê yên berjewendî perest re hebe, lê derfet û destkeftên Kurdan jî berfirehtir bûne.
Ger hûn plan dikin bizava Kurd bi dek û dolaban têk bibin, divê hûn beriya têkbirina Kurdan li belavbûna xwe razî bibin.
Dev ji gefan berdin, pêvajoyê bi durustî bimeşînin.

# Navenda Jiyan a tedawiya xwezayî

**Lîloz Hisên/Qamişlo**

**Rêveberiya Navenda Jiyan a tiba alternatîf Ezîme Mihemed destnîşan kir ku di çarçoveya tiba alternatîf de 100 giha ji bo çêkirina dermanê xwezayî têne amadekirin û wiha got: “Em dixwazin tedawiya dermanê xwezayî li nava civakê belav bikin û ji nû ve pêş bixin.”**

Bi derbasbûna demê re dermanên xwezayî hatine paşguhkirin û ji bîr kirin, ji ber pêşketina kargehên çêkirina dermanên kîmyewî. Di çarçoveya xebatên tiba alternatîf de li navenda Jiyan 100 cûreyên giha ji bo çêkirina dermanê xwezayî têne bikaranîn. Navenda Jiyan ya tiba alternatîf ku tê de hemû cureyên gihayên ku dibin derman ji nexweşiyan re bi rêbazên tedawiya xwezayî, têne çêkirin.
Navenda Jiyan a tiba alternatîf di bin sîwana Desteya Tenduristî ya herêma Cizîrê ya Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê li taxa Cûdî ya Qamişlo di sala 2023’an bi awayekî fermî hatiye vekirin.
Girdayî vê mijarê Rêvebera Navenda Jiyan a tiba alternatîf Ezîme Mihemed xebatên navenda Jiyan bi me re parve kir.

**Armanca vekirina navendên xwezayî**



Rêvebera Navenda Jiyan a tiba alternatîf Ezîme Mihemed destnîşan kir ku tedawiya bi dermanên xwezayî bê zirar in û sûdên wê pir bi encam in û wiha berdewam kir: “Ji ber ku bi salan tedawiya bi dermanê xwezayî hatiye paşguhkirin û jibîrkirin, em dixwazin ji nû ve tedawiya dermanê xwezayî di nava civakê de belav û pêş bixin. Xaka Rojavayê Kurdistanê dewlemend û gelek cûreyên nebatan şîn dibin, lê belê heta aniha sûd ji vê yekê nehatiye wergirtin. Yek ji mijarên sereke yê Navenda Jiyan a tiba alternatîf ew e ku dermanê xwezayî bi demê re tune nebe û sûd ji giha û nebatan bê wergirtin. Li navenda Jiyan dermanê xwezayî bi destên jinan têne çêkirin hem jî tedawiya gel tê kirin, li kêlek vê xebatê perwerdeyên çêkirina dermanê xwezayî tê dayîn da ku mirovên derdorê pê sax bibin.”

**Zehmetiyên peydakirina giyayan**

Ezîme Mihemed diyar kir ku ji ber kêmbarîna barana îsal gelek zehmetî dîtin di komkirina berhem û giyayên pêwîst û wiha berdewam kir: “Ji ber vê yekê me berê xwe da çandina giyayan. Du baxçeyên navendê hene û tê de giyayên ji bo çêkirina dermanê xwezayî em diçînin, hem jî da ku em zanibin ku giya heta astekê paqij e. Ji ber ku xebata me ji nû ve tê rêxistin kirin zehmetiyên cuda li pêşberî me derdikevin, wekî komkirina giya, zuhakirina wê, parastina giya, derxistina zeytê ji tov û giyayan, kelandina wan. Herwiha peydakirina amûrên ku em bi riya wan derman amededikin.
Di çêkirina dermanan de em giyayên wekî Iklîl Cebel, reşreşk, meyremiyê, kizbera, qurnefil, zencebîl û beybûn û nêzî 100 cûreyên gihayan bi kar tînin û ji hin şînahiyan zeytê derdixînin û ji bo nexweşiyan bikrtînin.”

**Cureyên nexweşiyên ku têne tedawîkirin**

Ezîme Mihemed diyar kir ku nexweşên têne navenda wan dema encamê digrin gelek nexweşên din bi xwe re tînin û got: “Ev yek jî nîşan dide ku ji tedawiya bi dermanê xwezayî kêfxweş in, êdî hestekê pir xweş em dijîn, lewma ev yek dihêle em zêdetir xebatên xwe xurt bikin.
Di nava van nexweşiyên ku em li navendê tedawî dikin û derdikevin pêş wekî bîrov, sedefiyê, ekzîma, dîsk, çong, pirsgirêkên hestî, pirsgirêkên rovî, nexweşiyên girêdayî jinê .”

**Alavên li navendê têne bikaranîn**

Di navenda Jiyan de alavên kelandinê ji bo derxistina ava paqij û zeyta giha heye, alava derxistina zeyta zelal ji tovan, alava kapsula heye û alava ji bo ku piştê dûz bike.
Rêvebera navneda Jiyan Ezîme Mihemed destnîşan kir ku gelek welatî ji bona xwe tedawî bikin berê xwe didin navenda Jiyan û wiha got: “Navenda Jiyan ji seat 8‘ê Sibehê heta 3’ê nîvro nexweşan pêşwazî dike. Her derman buhayê wê dighêje 50 hezar leyreya Sûrî li gorî nexweşiyê û buhaya muayenê em gelek bi welatiyan re alîkariyê dikin.” Rêvebera navenda Jiyan a tiba alternatîf Ezîme Mihemed wiha gotina xwe qedand: “Gereke mirov hişyar be dibikaranîna giha ji ber ku bikaranîna şaş bandorê li ser jiyana mirovan dike, her tişt sînorek jê re heye û bikaranîna giyayan, herwiha ji bona çêkirina dermanan jî wiha ye.”
Di navenda Jiyan ya Tedawiya Xwezayî de 3 xebatkarên jin hene li kêleka wê jî xebatkarên mêr cihê xwe di karê çandina giyayan de digrin. Ji bo perwedeya çêkirina dermanê xwezayî 4 jin hene û fêrî hemû cureyên dermanên xwezayî û çawaniya tedawîkirina bi awaykî xwezayî dibin.



# Mihemed Elî: Erdogan projeyeke hêzên sermayedar e

Nivîskar û lêkolînerê siyasî Mihemed Elî diyar kir ku niha li ser Sûriyê û giştî Rojhilata Navîn 3 proje hene, yek jê ya Îran e ku li ber têkçûnê ye, yên din jî projeya Îsraîl û ya Tirkiyê ku di nava pêşbaziyê de ne, li hemberî wan jî projeyeke civakî ya neteweya demokratîk a Rêber Apo heye.

**Ronahî Sadûn/Qamişlo**



Derbarê planên li Bakur û Rojhilatê Sûriyê, Sûriyê û Rojhilata Navîn bi taybet yên dewleta Tirk, Nivîskar û lêkolînerê siyasî Mihemed Erselan Elî bersiva pirsên Rojnameya me da û hevpeyvîn wiha bû:

**Planên dewleta Tirk li ser Bakur û Rojhilatê Sûriyê, Sûriyê û Rojhilata Navîn çi ne?**

Ji destpêka kirîzên Sûriyê planên Tirkiyê di Sûriyê û herêmê giştî de hene. Erdogan demê waliyê Istenbol bû û di hilbijartinê de bû serokkomar di wê demê de salên 2007 û 2008’an serdaneke wî ji bo Emerîka çê bû. Li wir ew bi hin saziyên Emerîkî û hin rayedarên Ewropî yên li Emerîka re civîn çêkirin, ew civîn nêzî 7 rojan dewam kir. Piştî ew civîn bidawî bû Erdogan vegeriya Tirkiyê û kongreyekî Rojnamevanî lidar xist, di wî kongrî de daxuyaniyeke da û ev axaftin kirin; “Ez sozdarê fermî yê projeya Rojhilata Navîn a nû li herêmê me” bi vê axaftinê tekez kir ku wî ew erk stand û gerek bi vî karî rabe. Li ser wê bingehê hemû hêzên sermayedar ên cîhanê alîkariya Erdogan kirin ku hemû daxwazên wî pêk bînin. Ji ber wê li hemberî êrişên Tirkiyê yên li ser Tevgera Azadiya Kurdistanê, hemû hêzên sermayedar Ewropa, Emerîka û dewletên Ereb ên herêmê bêdeng diman, ji ber erekî dabûn Erdogan, ev erk di Buhara Ereban de dest pê kir. Me dît jî çawa hemû terorîstên di cîhanê de dihatin Tirkiyê, ji wir derbasî Sûrî û Iraqê dibûn, piştî wê ji Sûriyê birin Lîbiya, şerê Ermînya û Ezrebîcanê. Lewma em nikarin Erdogan wek kesekî bigirin dest, lê wek projeyekî hêzên sermayedare, eger em bi vî çavî lê binerin, em ê bitir Erdogan û karê wî di Rojhilata Navîn de çi ye, nas bikin. Ji destpêka kirîza Sûriyê erkê Erdogan bû ku çeteyên di cîhanê de hene hemû wir Tirkiyê û wan ji Tirkiyê derbasî Sûriyê bike û li gorî wî çi li beramberî rêjîma Sûriyê şerekî bidin meşandin û li gor wî birûxînin. Lê yê bûn asteng li pêşiya wî Kurd bûn ku ji destpêka kirîzê pirsgirêkên Erdogan, Kurd bûn. Salên 2012’an ew giropên di bin navên cûda cûda ku hemû komên cîhadîst ên ku di Sûriyê de hebûn, taybetî li Bakurê Sûriyê Erdogan bi wan re şert danîbû ku ew ê çek, alîkarî û hwd bide wan, lê gerek ew bi Kurdan re lihevdû nekin û gorî wê kengî ew ji wan bixwaze gerek ew şerê Kurdan jî bikin. Lewma ew giropên çete yên wê demê li ser vê bingehê hevpeymaneke bi Erdogan re çêkiribûn. Erdogan du kar dikir, yek plan an jî projeyên hêzên sermayedar ên Rojhilata Navîna mezin a nû pêk tîne. Ya duyemîn projeya Tirkiyê bixwe jî heye ku ew erdên di sedsala 20’an de Birîtaniya û Ferensa ji destê wî birin vegerîne, di bin têgeha “Osmanî ji nû ve avakirin û zindîkirin” ku vê projeyê di bin navê Mîsaqa Milî pêk bîne. Destûrên li Tirkiyê tên naskirin, ew e Mîsaqa Milî ne ku bakurê Sûriyê bigiştî “Wîlayet Heleb” û bakurê Îraq “Wîlayet Mûsil” heta roja îro jî Tirkiyê van wek axê xwe dihesibîne. Ji bo wê demê Kurd li Bakurê Sûriyê dest bi şoreşê kirin, xema Erdogan yekemîn dijî Kurdan şer bike, ne dijî rêjîmê şer bike. Ev jî hişt nakokiyên wî û hêzên sermayedar ji 2013 û 2014’an li Sûriyê pir derkevin. Ji ber Emerîka yan hêzên sermayedar ji Erdogan dixwestin ku şerê rêjîmê bike, lê wî hemû girop li hemberî Kurdan da şerkirin.
Di encamê de şer dewam kir, şerê DAIŞ’ê jî di sala 2014’an de derket, piştî wê giropên cûda cûda her êrişî Kurdan dikirin. Lê di encam de piştî rêjîma Sûriyê reviya û çû Rûsya, valatiyeke pir mezin di hundirê Sûriyê de çê bû. Di vir de Erdogan bi çavekî li xwe dinere ku divê Sûriyê ji mafê wî be, ji ber ewqas alîkariya giropên çete kiriye, hem jî li Sûriyê çi bibe û çi biryarên siyasî bê sitandin, gerek di bin erêkirina Tirkiyê de be. Di heman demê de li Sûriyê di hin cihan de kampên leşkerî ava bike, wek li başûrê Kurdistanê çawa nêzî 70 baregehên leşkerî, istixbaratî û ewlekarî çêkiriye, dixwaze heman tişt di hundirê Sûriyê de ava bike. Da ku di rêya wan de kontirolê li Sûriyê bike. Li ser vê bingehê Tirkiyê pir hewildan dike ku van tiştan pêk bîne. Lê heta niha biser neketiye, ji ber hebûnê Kurdan di Bakur de, bû kelemekî pir mezin li pêşiya projeya Erdogan, hem jî hêzên herêmî yên di hundir Sûriyê de wek Misir û Siûdiyê, nahêlin Tirkiyê zêde gaviyên mezin bike. Hêzên sermayedar dibêjin me Îran ji Sûriyê dernexistiye ji bo Tirkiyê were wê valatiyê dagire. Ji bo wê Emerîka û hêzên sermayedar niha Sûriyê radestî du aliyan kirine, aliyê madî û biryarên wî girêdayî Siûdiyê ye. Lê ew nikarin dev ji Tirkiyê jî berdin, lewma hin rol dane Tirkiyê jî ku di hundir Sûriyê de hinek tevgerê wî hebe. Lê li Bakurê Sûriyê zêdegavî bavêje wê lê bidin, mînaka wê dema Tirkiyê xwest di hundirê firogehê Hema yan derdorê Şamê cihê xwe çêke, Îsraîl lê da û ew derxist. Di hundirê Sûriyê û Îraqê de berjewendiyên Tirkiyê pir mezin ku dixwaze jinûve Osmaniyekî bi modêl ava bike û Erdogan bibe xelîfa wî tiştî.

**Di Rojhilata Navîn de çi proje hene û ev proje çima projeya Rêber Apo metirsî li ser xwe dibînin?**

Di Rojhilata Navîn de 3 proje hene, ew proje di nentiqê dewlet de ne û pêşbaziyek di navbera wan de heye. Yek projeya Tirkiyê dixwaze milê sûnîtî ku Osmaniya kevin nû bike û bibe desthilatdar. Projeya 2’emîn hema têk çûye ku ya Îranê bû, dixwest hîlalê Şêî ava bike, ji Tehranê were Bexdad, ji Bexdad were Şamê ji Şamê here Beyrût û ji Beyrût here Filistîn. Lê piştî şerê 7’ê Cotmehê yê di navberî Hemas û Îsraîl de çêbû, tiliyên Îran di herêmê de hemû hatin pûçkirin, niha tenê Heşt Şeib li Îraqê dimîne, ew jî piştî lêdana Îran lewaztiyeke cidî jiyan dike. Projeya 3’emîn a Îsraîl e, hêzên sermayedar ew jî projeya Rojhilata Navîna mezin bi vî navî dixwazin pêk bînin. Lewma niha 2 proje di herêmê de hene, ew her dû proje jî şerê hevdû dikin, yek projeyê Tirkiyê ya din projeyên hêzên sermayedar heye. Him Erdogan sozdarê projeya Rojhilata Navîne, hem jî dixwaz projeya xwe ya taybet pêk bîne û sûdê ji wî erkê bigre.
Lê li hemberî van her dû projeyan projeyekî cûda heye, ew jî projeyekî civakî ye ku Rêber Apo xwediyê wê ye. Projeya Rêber Apo li ser bingehê “Netewa Demokratîk” civak bê avakirin. Ji bo wê em dibînin hemû hêzên di herêmê de, taybet ên xwedî proje Îran, Tirkî û Îsraîlê ewqas şerê Kurdan dikin, lê ew ne şerê Kurdan dikin, ew şerê projeya neteweya Demokratîk dikin. Lewma ewqas tecrîd û pergala işkence û qirkirinê li ser Rêber Apo pêk tînin, ji ber dixwazin projeya wî lewaz, pûç, bêwate bikin û hemû tiştî bidin meşandin, da ku ev proje biser nekeve. Ji ber wê çiqas nakokiyên Îsraîl û Tirkiyê bi hev re hebin, lê dema mijar dibe Kurd lihevdû tên û pirsgirêkên xwe nabînin. Herwiha Tirkiyê erkê ku di sala 2007 û 2008’an pêk bîne, di heman demê de çi li beramberî projeyên Îsraîl derkeve, gelek Tirkiyê li hemberî wê bisekine û şer bike. Ji bo wê erkê ku Tirkiyê bide meşandin heye, di hundirê Sûriyê de dixwaze Kurd nebin xwedî statoyekî demokratîk ji bo bandor li Tirkiyê nebe û Kurdên li wir vê daxwaziyê nekin. Em dibînin jî piştî levkirina 10’ê Adarê di navbera hikumeta veguhêz a Sûriyê û QSD’ê de çê bû, Hekan Fîdan hate Sûriyê û nehişt Ehmed El-Şeri vê lihevkirinê li ser erdê pêk bîne, tersî wê mijara destûr û hwd…derxistin holê. Da ku wê lihevkirinê bêwate bikin, heta roja îro jî nepêkanîna wê lihevkirinê sebebekî mezin Tirkiyê ye, hemû hevdîtinê din jî bi vî rengî tên astengkirin. Mestirsiya Tirkiyê ku Kurd bibin xwedî hêz û hebûn di Şamê de û tecrûbeya Başûrê Kurdistanê li wir jî çê bibe. Ya din jî Tirkiyê heye niha ew giropên çete birêxistin û kontirol dike, ji ber hîn erkê wan heye ku dixwaze wan li cihên cûda bide karkirin, ji ber axaftin pir hene ku îhtîmale di demên pêş Emerîka li cihên din şer derxîne û mecbûre bi rêya Tirkiyê vê bike. Lê demê erkê Erdogan xelas bibe wekî wî anîn wê ji wî jî xelas bibin.



**Projeya Rêber Apo û bangewaziya wî ya Aştî û Civaka Demokratîk di hundirê Sûriyê de çiqas bandor kir?**

Banga Rêber Apo bandora wê ne tenê di Sûriyê de, lê ser asta Kurdistanê û di herêmê giştî de heye. Ji ber li herêmê giştî tu alî ku xwedî projeyekî pirsgirêkên civakê çareser bikin nîne. Projeya Îsraîl a Rojhilata Navîn nabe çareserî ji bo civakê, wê bibe çareserî ji bo mentiqê dewletê. Tirkiyê jî projeya niha dixwaze bide meşandin çiqas di bin navê ku bi Rêber Apo re danûstandineke heye, lê negihaştiye wê qenatê ku daxwazên Kurdan û pêkhateyên di herêmê giştî de pêk bîne û civakeke demokratîk ava bike. Berovajî wê projeya wê heye û dixwaze wê pêk bîne, li ser wê bingehê desthilatdariya xwe li ser herêmê bide meşandin, heta danenasîna qoframa li cem wan cûda ye. Niha di bangewaziyên Rêber Apo de ji bo avakirina civakeke demokratîk û aştî behsa antegrasyona demokratîk, agirbes, şer bê rawestandin û ji qonaxa şer derbasî xebata demokratîk siyasî bibin. Lê Tirkiyê gorî xwe fêm dike ku çek deyînin û herin malê xwe rûnên, çi çêbibe em dengê xwe nekin. Tirkiyê li ser vê hatiye avakirin, li ser bingehê tunekirina gel û civakê, mentiqê wê jî aştî ev e komkujî û bêdengkirina civakê. Herwiha antegrasyon jî bi guhertina miletan tê kirin. Ji bo wê eger banga Rêber Apo di hundir Tirkiyê û Sûriyê de bê pêkanîn wê hemû pirsgirêk bên çareserkirin. Lê gelo Tirk û hikumeta veguhêz amadene vî tiştî pêk bînin, heya roja îro tu projeyên wan ji bo avakirin civakekî demokratîk û aştî ji devê wan derneketiye. Sûriyê niha du hilbijartin li pêşiya wê hene, Sûriyeke ku wê xwe dûbare bike ji bo sedsalekî din û heger hikumeta niha li ser zihniyeta xwe ya navendî israr bike, wê şerekî navxweyî yê mezin derkeve. Yan li ser bingehê daxwazên pêkhateyan Sûriyê divê Sûriyeke nû bê avakirin ku bingehê wê nenavendî û demokratîk be.

# Bandora şer li ser mirov û jiyanê...(1)

**Ji bo berjewndiyên desthilatdariyê bi sedê salan e şer û pevçûn bê navber diqewimin, helbet yê ku ziyanê dibîne jî mirov e. Di şerê Cîhanî yê yekemîn û duyemîn de bi milyonan mirov jiyana xwe ji dest dan û cîhan serûbinê hev bû. Ji xwe wekî her şerekî ku diqewime yên bûn qurban mirovên sivîl bûn.**

**Birûc Resûl/Qamişlo**

Di sedsala 20'an de di li cîhanê dû şerên giştî yên giran rû dan: Şerê Cîhanî ya Yekem (1914-1918) û Şerê Cîhanî ya Duyem (1939-1945). Ev şer ji bo cîhanê wekî erdhejeke tinekirina aştî û aramiyê bû. Ev her dû şer ne tenê bûn sedema ku gelek mirov jiyana xwe ji dest bidin, lê belê bandorên pir xerab li giştî cîhanê kir. Herwiha ev her dû şer pêşeroja gelek mirovan xist bin tariyê de. Bê guman şer bi cihên cûda û demên cûda hat meşandin û yê ku ziyan dît, koçber bû, hat kuştin û derbiderkirin mirovên sivîl bûn.



### Bandor şerê cîhanî ya yekem

Şerê cîhanî yê yekem şerekî mezin bû ku piraniya welatên Ewopayê û cîhanê tê de pişdar bûn. Ew şer ji sala 1914`an heta 1918`an berdewam bû. Şer di çiriya paşîn a 1918`an de bi dawî bû. Di vî şerî de bi milyonan mirov hatin kuştin û rewşa siyasî ya cîhanî hat guhertin.

Şerê Cîhanî yê Yekem ji bo mirovan û civakên cîhanê qonaxeke vceguherînê bû. Ev şer ne tenê rêxistina siyasî û sînorên nû ava kir, bi xwere gelek xerabî anî ku bandorekî neyinî li ser jiyan û deroniya mirovan jî kir, herwiha bû sedema ku gelek kes jiyan xwe ji dest bidin. Rewşa ekonomiya şer ji bo mirov rêkxistina herêmî, xwedî bandora dirêj bû û xweseriya civakî şikand. Ji ber mirina milyonên kesan, li gelek herêmên Ewropa û cîhanê rewşa demografîk guherî. Dawiya şer rê vekir ji bo çêbûna dewletên nû wekî Iraq, Sûriye û hin dewletêm din. Şerê cîhanê ya yekem ji bo mirovan jiyana derunî, aborî û civakî têkbir û zextên giran li ser wan da avakirin. Bi awayekî giştî, ev şer ne tenê sînoran û siyaseta cîhanê guherand, lê şikl û wêneya nû ya jiyana mirovan da guhertin.

### Bandora şerê cîhanî ya duyem

Şerê cîhanî yê duyem lihevhatina siyasî û avahiya civakî ya cîhanê guherand. Neteweyên Yekbûyî ji bo xurtkirina hevkariya navneteweyî û pêşîlêgirtina pevçûnên paşerojê hate damezrandin ku hêzên mezin ên serketî - Çîn, Fransa, Yekîtiya Sovyetê û Dewletên Yekbûyî, bûne endamên daîmî yên Encûmena Ewlekariyê. Yekîtiya Sovyet û Dewletên Yekbûyî wekî superhêzên derketin holê ku qonaxek ji bo şerê sar yê nêzî nîv sedsalê dirêj kirin. Piraniya welatên ku pîşesaziyên wan zirar dîtibûn ber bi başbûn û berfirehbûna aborî ve çûn. Lê ev jî tenê ji bo xapandina mirovan bû. Belê ev şer jî heya hat bidawî kirin jî zêdetirî 70 milyon kes hatin kuştin, herwiha bi milyonên kes koçber û penaber bûn. Ev şer ne tenê talankirî û mirin anîn, belkî jî bûn sedema guherandina cîhanê li hember siyaseta neteweyî, aborî û civakî bû.

### Şer û mirov

Bê guman her şer jî bandorekî pir mezin li ser jiyana mirovan dide avakirin, mîna tirsa ji mirinê û ji koçberiyê, her bi vê piskolojiyê dijîn, helbet zarok jî di nav de. Ji ber ku şer di serdema dirêj de nasnameya hestî û çandî ya mirovan di bin qirkirnê û pişaftinê dike. Mirov xewn, armanc û şopên xwe winda dike û bi awayekî zêde bi xeyalên mirin û dijwarî re dijîn. Ev têkiliya hestî pêşeroja mirovan qut dike. Ji bilî tiştên ku hatin ser ziman, bandora şer li ser ekeolojî jî heya, dema ku mirov behsa ekelojî bike, jiyana bi tendirust tê bala her kesî. Lê mixabin şer, rewşa ekeolojiyê kiriye rewşekî xerab de. Şewat û topebarankirina erd, ev hemî bandor li ser tevahî xwezayî dike, dema ku xweze were qirkirin, jiyan jî hêdî hêdî ber bi tune bûê de diçe.

### Koçberî

Piştî şeran pirsgirêka herî mezin koçberî ye. Du awayên koçberîyê hene. Yek ji wan koçberiya hundirîn; ya din jî ya derveyîn e. Mijara me li ser koçberiya derveyîn e. Koçberî tevgereka cografîk e ku mirov ji bo paşerojê ji cihekê biçe cihekê din, bo demeke kurt an jî bi awayekî mayînde. Her wiha koçberî, di encama hinek sedeman de bi şexşî an jî bi civakî pêk tê. Koçberiya ku di jiyana mirovan de xwedî cihekî pir giring e, weke hemû bûyerên civakî di bin bandora gelek faktorên aborî, civakî, çandî û siyasî de ye. Koçberî, li gorî civakan bi şikil û naverokên cuda pêk tê û bi demê re tundî û rêça xwe diguherîne. Her çiqas sedemên koçberiyê di nava civakên cûda de bişibin hev jî, bi tevahî ne wek hev in. Sedemên koçberiyê ji ber şert û mercên taybet an jî nirxên çandî yên civakan cuda ne. Lê sedema herî zêde ya koçberiyê ku heya niha bi milyonan mirov li seranserî cîhanê mecbûr man ku ji malên xwe derkevin, sedema sereke krîz, şer û pevçûnên tên qewmandin.

### Şerê cîhanê yê 3`emîn li ber derî ye

Bi Şerê Cîhanê yê Yekemîn re Şoreşa Cotmehê çêbû. Şoreşa sosyalîst cîhan ji şerekî bê dawî rizgar kir. Şoreşê bandor li cîhanê kir, bû hêvî berxwedan û mirovayetiyê pişta xwe rast kir. Di şerê Cîhanê yê 2'emîn tevlihev bû. Piştî qetlîamên mezin di Şerê Cîhanê yê 2'emîn de Elmanya têk çû û Hîtler xwe kuşt. Dîrokeke wiha heye ku şerên cîhanê bi xwekuştina dîktatoran bi dawî dibe. Niha jî analîz tê kirin ku Şerê Cîhanê yê 3'emîn li ber derî ye. Aloziya di navbera DYE û Îranê de ya çil sal in didome, bi êrişan re kûrtir bû. Dîrok dibêje ku di şerê cîhanê yê 3'emîn de wê gel şoreşê bikin. Ev tişt jî wê jixweber pêk neyê. Serdemeke nû ya şoreş û gelan dest pê kir. Welat parçe dibin, tên belavkirin lê di warê giştî de tiştek nexuyaye. Rojhilata Navîn herêmeke wiha ye ku netewe dewletan xwîn rijandine û wiha ava kirine. Di cewhera wê de jî konfederalîzma demokratîk heye. Zemînekî mezin ê neteweya demokratîk heye.

# Siyaseta hikumeta veguhêz siyaseta parçebûnê ye

**Aryan Hesen/Qamişlo**

**Endamê Meclisa Giştî ya PYD'ê Welîd Dîngilî diyar kir ku siyaseta hikumeta veguhêz li Sûriyê dimeşîne wê Sûriyê parçe bike.**

Girêdayî siyaseta perçebûn, neqebûlkirina pêkhateyan û guhartina demografîk ji aliyê hikumeta veguhêz li Sûriyê Endamê Meclîsa Gîştî ya PYD Welîd Dîngilî bersîva pirsên Rojnameya me da û hevpeyvîn wiha bû.

**Siyaseta ku hikumeta veguhêz dimeşîne hemû pêkhateyan hembêz nake û parçebûnê di nava gelan de çêdike, ev siyaset xizmeta kî dike?**

Siyaseta hikumeta veguhêz dimeşîme rêbaz û nêzîkatiyek parçebûnê di nava Sûriyê de ava dike û ev yek tenê xizmeta hêzên ku ev hikumeta çêkirî anîne ser desthilatê dike. Herwiha hêzên desthilat dixwazin parçebûnê di hundirê Rojhilata navîn de pêkbînin û destêka vê yekê ji Xezayê û Libnanê destpêkir û îro jî li sûriyê ev yek tê meşandin.
Lê ji ber ku Sûriyê mûzayîka gelan e, û têde gelek gel, netew û ol dijîn û ne gengaze ku ev siyaset li Sûriyê pêkwere û li hemberî vê yekê têkoşîneke bêhempa tê meşandin. Peymanên ku berê ji bona Rojhilata Navîn di nava hêzên serwerê cîhanê de hatibûn îmzekirin, îro tev bi dawîbûne û tu bandora wan li holê nemaye.

**Parçebûn, alozî, komkujiyên li ser gelan pêktên û sistemê navendî wê sberoja Sûriyê ber bi ku ve bibe?**

Gelê Rojhilata navîn ev bi sedê salye têkoşîna demukrasiyê dide meşandin û hertim ev herem bûye navenda pevçûnên navdewletî û heremî û gelê heremê jî hertim fatûreya van pevçûnan daye û heyanî roja îro jî dide. Li Sûriyê jî armanca wan ew e, ku gelê Sûriyê hev tesfiye bike û rewşa Sûriyê alûztir bibe û Sûriyê jî mîna Efxanistan û derverên din yên ku têde ne aramî û ne ewlehî hebe. Ger ku ev rewşa heyî bi vî rengî dewambike wê Sûriyê parçebibe û wê şerê navxweyî di nava gelan de



derkeve. Ji bona vê sistemê herî guncav ji bona siberoja Sûriyê sistemê nenavendiye, ji bona pêkanîna vê yekê jî pêwîste ku gelê Sûriyê tev bikeve di nava seferberiyê de.
Ger ku yekîtî û hevgirtina gelan û têkoşîna hevbeş li hemberî hişmendiya ku îro li Sûriyê tê meşandin neyê meşandin wê rewşa heyî hîn alûztir bibe û wê çareserî li Sûriyê pêkneyê. Cîhana ku van komkujî û kiryarên dijmirovî yên ku li ser gelê Sûriyê bi çavê xwe dibîne û çavê xwe jê digre ew jî hevkarê van komkujiyan e.
Li hemberî êrîşên ku bi alîkariya hikumeta veguhêz li ser hemû pêkhateyan li Sûriyê tê meşandin û di serî de dewleta tirk a dagirker pişgiriya wê dike. Herwiha pêwîste ku herkes vê yekê bibîne û bizanibe ku dagirkeriya tirk naxwaze ku aramî û çareserî li Sûriyê pêkwere, ji bona vê yekê jî çi ji destê wê tê wê bike.
Hikumeta veguhêz û bi destê dewleta tirk guhertina demografîk didine meşandin û dixwazin gelê Kurd bi darê zorê ji cih û warên wan koçber bikin. Di serî de li heremên dagirkirî ev yek tê meşandin û li bajarên mezin mîna Şam, Humis û deverên din jî vê yekê pêkbînin. Xwezaya heremê jî di nav de herem tev tê talan û wêran kirin û bazarî di nava hêzên heremî û cîhanî de li ser Sûriyê tê kirin.

**Hikumeta guh nede daxwazên gelê xwe ji bona jiyaneke azad û civakeke demukrat wê çawe baweriya wî gelî qezenc bike?**

Hikumeta ku komkujî û qirkirinê li ser gelê xwe pêktîne û cih nade vîna gelan û baweriya pêkhateyan, wê tucaran nebe cihê baweriyê û wê nikaribe nûnertiya gel bike. Hikumeta veguhêz dewama hişmendiya rêjîma Baas pêktîne û dixwaze bi komkujî û qirkirinê vîna gelan bişkîne û sîstemekê navendî li Sûriyê pêkbîne. Sûriyê pêwîtiya xwe bi pir rengiyê, azadiyê, demokrasiyê û armaniyê heye, lê hikumeya ku niha li ser desthilatdariyê berûvajî vê yekê dike û kesî ji derveyî xwe qebûl nake. Ji milekî din ve yê ku ji bona siberoja Sûriyê têkoşîn, kar û xebatê dide meşandin Rêveberiya Xweser û QSD'ê de ye, û ancax bi sistemê netewa demukratîk û rêveberiya ku îro li Bakur û Rojhilatê Sûriyê tê meşandin çareseriya aloziya Sûriyê pêkwere û hemû gel û pêkhate cihê xwe têde bigrin û bighêjin mafê xwe. Ev 14 salin di serî de gelê Kurd û hemû pêkhateyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê bê dewlet kar û xebatê xwe didin meşandin. Sîstema Rêveberiya xweser bi têkoşîn, kar û xebata xwe ya salên dirêj isbat kir ku ew dikare bi vê sîstemê tevahiya Sûriyê bi rêve bibe û heyanî astekî baweriya gelê Sûriyê qezenc kiriye. Herwiha sîstema rêveberiya xweser bûya nimûne ji bona tevahî cîhanê û tekane Sîstema ku têde mafê hemû pêkhateyan were parastin, misogerkirin û pêkanîna siberojeke bi ewle û azad ji bona hemû pêkhateyan.



# Li hemberî gef û êrişan, Şerê Gelê Şoreşgerî

**Di rewşa heyî de ku Sûriyê û bi taybet Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê tê re derbas dibe, girîngiya pêkanîna rêgeza Şerê Gelê Şoreşgerî û xweparastin xwe ferz dike.**

**Stêrk Mihemed/Qamişlo**

Sûriyê bi giştî û herêma Bakur û Rojhilatê wê bi taybetî, di rewşeke awarte de ne, rojane guhertinên bilez çêdibin. Di serî de dewleta Tirk a dagirker û çeteyên wê, hin alî hewl didin sûdê ji van guhertinan bigirin û herêmê dagir bikin. Ji ber van guhertin û hewldanên dagirkeriyê, girîngiya şerê gel ê şoreşgerî derdikeve holê.

### Têgeha Şerê Gelê Şoreşgerî

Şerê gelê şoreşgerî stratejiyek e ku li ser esasê beşdariya berfireh a gel di têkoşîna siyasî û leşkerî de ya ji bo armanca parastina mafan û bidestxistina guhertinên civakî û siyasî, hatiye avakirin. Di şerê gelê şoreşgerî de tevahî beşên civakê bi karker, kedkar, jin, ciwan kal, pîr û hwd, li hemberî rûbirûbûna pirsgirkên ewlehî, aborî û siyasî seferber dibin. Şerê gelê şoreşgerî têkoşîneke çekdarî tenê nîn e, modeleke têkoşîneke topyekûn a gel e ku armanca wê rizgarkirina civakan ji despotî, dagirkerî û kedxwariyê ye. Herwiha şerê gel ê şoreşerî wek têgeh, rizgarkirina civakî û bîrdozî ya ji bo avakirina civakeke demokratîk a li ser bingeha wekhevî û edaleta civakî ye. Şerên ku 5 hezar sal in li hemberî civakê tên meşandin, weke şerê êrîş, komkujî, îstîsmar û mêtingeriyê bûne sazî. Li hemberî van şeran, civak ji bo xwe li hemberî van êrîşan biparêzin, hebûna xwe ewle bikin, ewlekarî û azadiya xwe misoger bikin, divê parastina xwe bikin. Di demeke wiha de li cîhanê kulmek ax nemaye ku şaristaniya dewletparêz bi şer negihaştiye wê, dest neavêtiyê û serwerî pêşnexistî be. Ji ber vê yekê Şerên Gel ê Şoreşgerî yên li ser bingeha xweparastinê ya hemû mirovahiyê, gelekî cidîtir ketiye rojevê û divê bikeve rojevê. Ji ber ku pergala modernîteya kapîtalîst hemû mirovahiyê kiriye kole. Civak qetil kirin û xistin ber qirkirinê. Bi taybetî jî ji bo me Kurdan pêvajoya ku di bin lepên qirkirinê de ye berdewam dike û şerê hebûn û tunebûnê wek gel tê meşandin. Ji bo em li hemberî êrîşên qirkirinê yên pergala kapîtalîst bisekinin û hebûna xwe û azadiya xwe biafirînin, divê em têkoşîna xwe derxînin asta herî bilind. Ji ber vê sedemê ji bo me ketina nav Şerê



Gel ê Şoreşgerî rewşeke gelekî lezgîn e.

### Li Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê Girîngiya Şerê Gelê Şoreşgerî

Gelê herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê di pêvajoya aloziya Sûriyeyê de ya di bihara 2011□an de dest pê kir, xeta sêyemîn hilbijart. Gelê herêmê bi tevahî pêkhateyên wê di bin sîwana Rêveberiya Xweser de xwe bi rêxistin kir, saziyên xwe yên civakî, ewehî, leşkerî, perwerde, xizmetguzarî, siyasî û hwd ava kirin û herêmên xwe ji çeteyan rizgar kirin û di oxira vê de zêdetirî 12 hezar şehîd û zêdetirî 22 hezar birîndar dan.

Gef û êrişên dewleta Tirk a dagirker ên li ser herêmê dîsa jî dewam dikin. Dewleta Tirk jî hem bi artêşa xwe, hem bi çeteyan xwe û hem jî bi şaneyên xwe yên li herêmê xistine nava tevgerê û hewl dide vê projeyê têk bibe, fitneyan derxe û yekitiya gel ji holê rake. Şerê gelê şoreşgerî û seferberiya giştî ya tevahî pêkhateyên civakî, dikarin pêşî li van hewldanan bigirin. Di dema niha de Bakur û Rojhilatê Sûriyê di rewşek hesas û girîng de ye, dijmin bi her awayî dixwaz e aramî û rêxistina vê herêmê xerab bike. Li kêlekî şerê çekdarî şerê taybet dimeşîn e, bi riya vî şerî dixwaze bandorê li civakê bike û şerê navxweyî di nava gelê Kurd de ava bike. Ji ber vê yekê jî ji bo Kurdan rêxistinkirin, yekbûn û xweparastin girîng e. Pêwîste ne tenê gelê kurd lê belê tevahî pêkhate, sazî û dezgehên ku li Bakur û Rojhilatê Sûriyê dest, deng û armanca wan yek be, ji bo parastina war û hebûna xwe. Ji bo vê yekê jî Şerê Gelê Şoreşgerî girîng e û wê li pêşiya hemû alozî û hewaldanên dijminan bigire.

### Rola pêşeng a jin û ciwanan e

Di şerê gel ê şoreşgerî de rola jin û ciwanan ya pêşeng e. Ev jî rola wan di civakê de xurttir dike û dînamîkeke civakî ya li ser esasê wekhevî û beşdariya çalak ava dike. Aşkera ye ku bêyî azadiya jinan civak azad nabe. Lewre jî beşdariya jinan di şerê gel ê şoreşgerî de ji bo pêkanîna guhertineke civakî ya bingehîn şert e. Rola sereke di serkeftina Şerê Gelê Şoreşgerî de ya jin û ciwanaye. Ji ber ku jin endama herî bandor di nava civakê de ye û ciwan ew dînemîka ku civak wê li ser ava bibe ye. Azadiya civakê bi ya jinê ve girêdayî ye, ji ber vê jî eger rol û azadiya jinê neyê dîtin, azadî û aramiya civakê nayê dîtin. Jin li herderê de pêşengtiyê dike û di xeta yemîn de cihê xwe digire, di şoreşa Rojava de pêşengtî kir û di şerê gelê şoreşgerî de jî pêşeng e. Ji ber ku xasteka jin ya yekemîn azadî û rêxistinkire. Herwiha ciwan bi çalakiyên xwe û giyana xwe ya şoreşî û welatparêzitê wê serkeftina şoreşê û şerê gelê şoreşgerî misoger bikin.

### Rola komîn û meclis

Projeya Rêveberiya Xweseriya Demokratîk a Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê, li ser esasê komînan hatiye avakirin. Komîn di esasê xwe de bi rêxistinkirina civakê ye, mîsogerkirina beşdariya çalak a şerê gelê şoreşgerî ye. Endamên komînan erdnîgariya xwe ji gef, êriş û hewldanên destdirêjiyê diparêzin. Rola girîng di pêkanîna şerê gelê şoreşgerî de ya komîn û meclîsa ye, ji ber ku yê civakê birêxistin dike komînin. Herwiha erka komînê ye ku civakê komî ser hev bike û kombûnekê di nava civakê de çêdike. Herwiha yê ku di şeran de gel bi rêxistin dike komîn û meclîsin, ji ber vê yekê roleke wan ya sereke heye.

### Rêber Apo Şerê Gelê Şoreşgerî wiha nirxand:

Divê gel, civak, gel bînin asta rastiya gel a şer dike. Divê karaktera rastiya gel a şerker were bidestxistin. Çi dibe bila bibe, divê were bidestxistin. Şerê li Kurdistanê ne tenê şer e. Şerê hebûn û azadiyê ye. Di vê karakterê de şerek heye. Bi girtina di nava lepên qirkirinê de hewl tê dayîn ku Kurd bi şerê qirkirinê bi tevahî bên tinekirin. Kurd ji bo hebûna xwe, parastin û domandina hebûna xwe divê di vî şerê hebûn û azadiyê de bi ser bikevin. Ger nikaribin vê bikin, wê nikaribin ji tunbûyîna tam rizgar bibin.
Hêzên ji derveyî Kurdan bimînin, wê herî zêde berjewendiyên xwe yên herî mezin winda bikin. Lê hebûna Kurdan mijara gotinê ye. Kurd yan wê rewşa bidestxistina hebûn û azadiya xwe biceribînin û yan jî wê rastî qirkirinê bên. Ew ji fêmkirina bê ka bi şerekî çawa rû bi rû ne û di kîjan rastiyê de ne dûrin. Di encamê de wê çi bibe pêşbîniyek tune. Li gorî vê, bi têgihiştinekê nêzîkbûn, li gorî wê rêxistinkirina gel û şer, bidestxistin û pratîkkirina hêza şer a di wateya rasteqînî de tune ye. Ev rewş ji bo gel û tevgerê metirsiyên mezin çêdike. Dikare bibe rewşek ku bi qirkirin û qetlîamê bi encam bibe. Di nava şer de ne, lê nikarin gel, civak, mirovan li ser bingeha rastiya şer bi rêxistin bikin. Li şûna ku her tiştî li gorî rastiya şer bi hemû aliyên xwe ve pêk bînin, mîna ku li gorî rewşek civakî û aborî ya asayî dijîn. Ev jî; nîşan dide ku ew çiqas ji rastiya şer, ji giraniya şer dûr in. Belê weke mirov, civak û ferd pêwîste di her warî de jiyana xwe li gorî şer birêxistin bikin. Di şerê cîhanê yê sêyem de wê nekare bi awayekî din hebûna xwe biparêze û bidomîne. Ev ne hilbijartin e, pêwîstiyek e. Yan wê li ser esasê rastiya gelan a şerker xwe birêxistin bikin û li ser vê bingehê hebûna xwe biparêzin, yan jî bi pêk ne anîna wan wê bi komkujî, qirkirin û tinekirinê re rû bi rû bimînin.
EZ; dibêjim ku hûn bi komkujî û qirkirinê re rû bi rû ne, li gorî wê divê hûn jiyana xwe û her tiştî li gorî wê bi rêxistin bikin. Ez vê wek henek nabêjim! Ez behs dikim ku hûn di nava pêvajoyeke şer a çawa de ne û dibe ku çi bibe. Gelo mîna ku şer tune be, mîna ku di nava şer de nîne mirov dikare bijî? Ma gengaz e ku mirov bi vî rengî tevbigere? Dibe ku tiştekî wisa hebe ku şer tunebe, wekî ku xeterî tune be? Ma mirov dikare bêje ku em dixwazin wekî gel, civak û takekes çawa dilê me dixwaze emê wisa bijîn? Dikare were gotin an jî kirin ku em tevî şer jî emê wekî ku dixwazin bijîn? Hêzên şerker çawa şer kirin û çi kirin her roj tê dîtin. Rewşên xedar diqewimin û pêk tên.
Gel, civak û mirovê Kurd wê hemû jiyan û têkiliyên xwe li gorî şer birêxistin bike. Ger hûn jin û mêr bin jî, hûnê xwe kontrol bikin ku pênc salan destê xwe nedin hev. Hûn ê karibin xwe dîsîplîne bikin. Ger li ser esasê rastiya gelê şer dike di hemû aliyan de xwe bi rêxistin nekin, wê nikaribin hebûna xwe biparêzin. Wê bi komkujî û qirkirinê re rû bi rû bimînin. Her tişt pir zelal e. Tiştekî ku nayê fêmkirin nîne."